

Lêvger? An Lê vegergeh?

R.Elî

Jîn, tevger û çalakiyên mirov, pir tiştên nûjen bi xwe re tînin. Wek nimûne, belkî berî niha bi sed salî, bêjeya ((partî)) bi wateya xwe ya niha bi kar nedihat û nedihat naskirin. Lê di pêvajoya şaristaniyê û jiyana nûjen de, wê bêjeyê şeweyê xwe yê zelal û diyar di warê siyasetê de stand, û roja îro, pîremirov jî û zarok jî, baş dizanin ku wateya bêjeya ((partî)) çî ye.

Lê gereke em ji bîr nekin ku ew bêje, bêjeyeke Kurdî ya kevin e, belkî wê baş wateya xwe siyasî ya niha nedida jî. Lê wateya wê ya kevin jî, ji ya niha ne dûr bû.

Li vê dawiyê, piştî ku (Hevbenda Demokrat a Kurd li Sûryê) pêşniyara lidarxistina kongirekî netewî Kurdî li Sûryê kir, bêjeyeke nû(Merci'iyê) hat holê û pêwîstî bikarhatina wê çê bû.

Wek adetê, hin nivîskarên siyasî yê zimanê Kurdî, pir li xwe neheyirîn, belkî pir tê nefkirîn jî, hema ew bêjeya Erebi wergerandin Kurdî û gotin (pêwîstî bi lêvegereke Kurdî heye).

Di baweriya me de, bêjeya (lêveger) mebesta ku hêvî jê dibe, û ji bo wê hatiye çêkirin û bikaranîn nade, û ji bingeha rêzimên û bêjesaziya Kurdî jî dûr e. Ji ber ku bêjeya em dixwazin gereke vê wateyê bide: Cih yan cîgeha lêvegerê, ne (lêvegerê)

bi xwe ye.

Wek em dibînin, ya rastir ew e ku gereke bejeya (lêvegergeh- vegergeh) ango cihê ku vegeer lê çê dibe û dibe cihê vegeerê û lêvegerê bi kar bihata, ew jî li rêza rêzmanî ya van bêjeyan tê: Nivîsgeh, wargeh, biryargeh.. û hwd.

Ji ber ku bêjeya (lêveger- vegeer) a ku ji Erebi hatiye wergerandin, ew bi serê xwe diyar dike ku mera li tiştêkî gumandar û ne tekûz dinêre, hûrik hûrik lê temaş dike û lê vedigere ta sererast û li saz dikeve. Ango (lêveger) mebesta (Merci'iyê) nade. Lê hema (lêvegergeh yan jî vegergeh), diyar û rave dike, ku cihêk, warek, komek, civatek, devereke... heye, cihê lêvegerê ye. Eger mirioy bixwaze tiştêkî jê bixwaze, şewrekê lê bike, nêrîn, baweriyan û belkî çaresriyan jî bibîse, kane li wir vegere, li wê vegere, ango ew cih dibe lêvegergeh û vegergeh

Loma jî, û hîn em li destpêka bikaranîna wê bêjeyê (têrmê) ne, gereke em xwe şaş nekin û têrm û bêjeya Kurdî ya rast û Ji bilî bêjeya (vegergeh), bêjene din jî wek: Make, Motik, navend, navendgeh hene, belkî ew wê wateyê baş nadin û zelal nakin jî, lê dîsa ji bêjeya (lêveger) rastirin û wateyê jî ji wê baştir şirov dikin.

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê
me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de*